Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 36
31'ê Mar 2006
Buha: 150 Tûmen

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

## NEWROZA WE PÎROZ BE

Em Newroz, cejna neteweyî û dêrîn ya Kurdan û sersala nû ji hemû neteweya Kurd pîroz dikin. Bi vê hêviyê ku Newroza 2006'an bibe Newroza serkevtina armancên neteweyî yên Kurdan azadî, serbestî û aştî di Kurdistanê de.

**Desteya Nivîskar ya Agirî**



PDK Îranê di peyama xwe ya Newroza 2006'an de:

# Newroz Bibîranîna Azadî, Yekîtî Û Serkevtinê Bi Ser Xwînmijên Wekî Zehakî Ye




## Şahiya Newrozê Li Binkeya Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Hate Pîroz Kirin

Nûçe Di Rûpela 5'an de

Bûş, hişiyarî da Îranê:

## "Ger Hewce Be Em Dê Ji Hêza Leşkerî Bo Berevanî Kirin Ji Îsraîlê Mifahê Bistînin"



Roja duşem 21.03.2006'an, Corc Bûş, Serok Komarê Amerîkayê hişiyarî da Komara Îslamî û eşkere kir ku Dewletên Yekbûyî bo berevanî ji Îsraîlê, ger hewce be dê ji rêya leşkerî mifahê bistîne. Bûş da zanîn ku Komara Îslamî gefek micid bo ser Îsraîlê tê hesibandin. Bûş zêde kir ku armanca Komara Îslamî, ji holê rakirina hevalbendê nêzîk yê me ango Îsraîlê ye. Eve gefeke micid dijî aştiya cîhanê ye.

Bûş anî ziman ku berê jî min îşare pê kiriye û niha jî dîsan tekezê li ser dikim ku ji bo parastina hevalbendê xwe renge em ji hêza leşkerî mifahê bistînin.

Bûş li doma gotinên xwe de bi hêvî bû ku bikarin ji rêyên dîplomatîk ve kirîza heyî çareser bikin û xwasta Îranê ji bo bidestxistina çekên Etomî nahê qebûl kirin. Her wiha Bûş mijara gotûbêjên pêşerojê di navbera Îran û Amerîkayê de anî ber bas û got ku Îran divêt bizane ku ev mijare tenê li ser pirsên Îraqê ye.

'BBC'

### Peyama Newrozî Ya Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê

Newroz ne her tenê ji bo xwezayê peyama azadî û vejînê tîne, belkî ji bo mirov jî ku di hemû warên jiyanê de mînakê ji xwezayê werdigire, sembola nûbûnê û hayderê serhildanê ye ... R. 2-3

### Peyama Newrozî Ya Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê, Rêzdar Mistefa Hicrî



Em bi vê hêvî û xweziyê pê davêjne sala nû ku Newroza îsal her tenê nûbûna sale nabe, belkî destpêka saleke nû ji guhertinan ber bi azadî û serbestiyê jî bibe ... R. 4-5

### Bandora Îranê Li Ser Rewşa Siyasî Ya Îraqê



Bûş rasterast rejîma Komara Îslamî di kiryarên terorîstî û li kuştina serbazên Amerîkayî di Îraqê de tawanbar kir ... R. 6

### Rewşa Jinên Kedkar Yên Kurd Di Kûrexaneyên Îranê De




Jiyana Jinên kedkar di kûrexaneyên Îranê de gelek dijwar e ... R. 7

### Rewşenbîrû Şaristaniyet

Rewşenbîrî xizmeta şaristaniyetê dike û şaristaniyet jî rewşenbîriyê pêdigehîne, wate hev dikemilînin ... R. 9

### NEWROZ



Newroz, raperîna bindestiyê û serkeftina hemû gelên qedîm ên Rojhilata Navîn e.... R. 10

www.agiri.org

# Peyama Newrozî Ya Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê

**Hevwelatî yên hêja!**
**Civatên azadîxwaz yên xelkê Kurdistanê!**

Em hatina sala nû û Newroza xweşikî û hezkirinê, serhildan û rabûnê ji we pîroz dikin. Dîsa Newroz wekî edeteke herdemî qerisîn û cemidîna neguher û take rengiyê dişkîne û mizgîniya pelek nû û pirreng ji bo xwezayê tîne. Sirûda bihara nûbûnê û vejînê jêre dihûne û tên û germahiya vejiyanê û rabûnê dixe laşê sirêbirî. Newroz ne her tenê ji bo xwezayê peyama azadî û vejînê tîne, belkî ji bo mirov jî ku di hemû warên jiyanê de mînakê ji xwezayê werdigre, sembola nûbûnê û hayderê serhildanê ye. Nemaze ji bo me Kurdan ku em bi cejneke kevnar ya xwe dizanin, Newroz bibîranîna azadî, yekîtî û serkevtinê bi ser xwînmijên wekî Zehakî ye. Çawa xweza namire û tevî biharê diveje, berdewamiya Kurdan jî di xebata azadîxwazane ya xwe de selimandî ye qerisîna dîktatoriyetê û kirêveya stem û zordariyê qet nikarin mistên vîna asin ya wî gelê û û bêhîs bikin û hêviya keskiya serebstiyê jê bistînin, li mêj sal e zistanperwerên mejî cemidî, cehd û hewlê didin têhn û germahiyê ji agirê hêviya me bistînin, lê eva agirî Newrozê ye û hemû salê caneke nû dide hêviyên me û xermana komployên dujmin dişewitîne; lewra bê hêcet nine ku dibêjin:

**Cejneke kevn ya Kurdan e, bi xweşî hateve.**

Em îsal jî di demekê de cejna Newrozê pîroz dikin ku hêşta sîbera reş û tarî ya dîktatoriyetê, baskê xwe bi ser Îranê û Kurdistana me ya xweştivî de kişandiye. Niha jî ciwan, jin, rewşenbîr, kedkar, azadîxwaz û bi giştî tev çîn û qatên civaka Îranê di bin zextên herî dijwar yên aborî, siyasî û civakî de ne. Rejîma dîktator ya Îranê ku tu cure rewayî û berheqiyek ji cem xelkê Îranê û civaka navneteweyî nemaye, ji bo parastina desthilata binajoxwaz ya xwe ji aliyekê penah biriye ber teyarkirina xwe bi hemû çekeke tevkuj û ji aliyê din jî hov û dirindane xelkê Îranê yê mandî ji desthilatê û neteweyên bindest yên vî welatî ji ber daxwaziyên xwe ên rewa xistine bin givaş û çewisandinê. Bikaranîna tund û tûjî û qirkirinê bi merema parastina desthilatê, mekanîzma dawî ya her hikûmeteke dîktator e. Heman ew hikûmetên ku serdemekê û ji bo demeke kin û demkî bi hinek dirûşm û sloganên xapêner û soz û ehdên "Utopia"a (cîhaneke xeyalî), bala parek ji xelkê bo aliyê xwe bikşînin û dengê wan werdigrin. Rejîma Komara Îslamî di destpêka hatine ser şola xwe de bi mifah wergirtin ji hesta şoreşvanî ya xelkê û nerazîbûn û bêzarî ya wan ji rejîma Paşatiyê, karî bi xapandina hemû aliyên siyasî yên din dûr bixe yan ji holê rake û bingeha paşverûyî, dîktatorî û zorxwaziyê ava bike û şoreşa neteweyên Îranê ji rêyê der bixe. Her ji yekem sala hatine ser kara xwe, dest da serkut, qirkirin û çewisandina azadîxwaz û cudabîrên Îranê, neteweyên Îranê û bi taybetî neteweya Kurd bi sedema azadîxwazî û daxwaza mafên xwe ketine ber êrîşên herî tund û xurt yên hikûmetê. Bi vî awayî hêdî hêdî û piştî demeke kin naveroka wê ji gel re eşkere bû û rûçikê qirêj yên wê ji bo xelkê xuya bû. Nebûna azadiyên siyasî û civakî, rewşa nebaş ya aborî, giranî, bêkarî, riziyok û dehan pirsgirêkên din yên civakî wek berfirehiya îtiyad (kêşandina madeyên narkotîkê), berçaviya hilatina mejiyan û hwd…, xelkê bizalhatî yê Îranê anî ser vê baweriyê ku ji vê çendê bêtir nikarin vê rejîmê tab bikin, lewre hêdî hêdî dengê nerazîbûna xelkê bilind bûye.

Heke em lênihêrînekê bi ser siyasetên Îranê di sala derbasbûyî de bidin, ji me re xuya dibe ku di vê salê de pêvajoya şermemezarbûna Komara Îslamî ya Îranê bezîneke zêdetir bi xwe ve dîtiye.

Li mêj sal e rejîma Komara Îslamî ya Îranê, bi sedema dijberîkirin tevî prosesa aştiyê ya Rojhilata Navîn, binpêkirina mafên mirovan û piştevanî ji terorîzmê di bin zexta navneteweyî de ye û bi gunehbar hatiye naskirin. Di çend salên borî de tirseke mezintir li dor Îranê ji bo civaka navneteweyî derketiye holê, ew jî teyarbûna vê rejîmê bi çekên Etomî ye. Rejîmek ku rêzê ji tu bingeh û qanûnek mirovî û navnetewî nagire, piştgirî ji terorîzmê û berfirehkirina wê berçaviyê yê kiriye siyaseta xwe ya sereke, civaka navneteweyî zexteke zaf yê xistiye ser ku heke dest ji dewlemendkirina Uraniyûmê ber nede, dê bi encameke nebaş re berbirû bikin. Nemaze ku di van çend mehên borî de welatên Çîn,

*NEWROZ BIBÎRANÎNA AZADÎ, YEKÎTÎ Û SERKEVTINÊ BI SER XWÎNMIJÊN WEKÎ ZEHAKÎ YE*

Rûsya û Yekîtiya Ewropayê jî ku berê li hember Îranê bi nermî dilivîn, em dikarin bibêjin tevî Amerîka hevdeng bûn û di Ajansa Vejena Etomî ya Navneteweyî de, aqibet dosya Etomî ya Îranê ji Konseya Ewlekariyê ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî şand. Bi liberçavgirtina vê rastiyê ku rejîma Îranê hetanî niha wiha dayiye xuya kirin ku bi tu awayekê naxwaze dest ji pirojektên xwe yên Etomî berde û gotûbêjên wê jî tenê ji bo kuştina demê û bidestxistina derfet û delîveyê hewce ye. Tê çavnihêr kirin ku pirsgirêk ber bi aloziyeke zêdetir biçe û di encamê de Konseya Ewlekariyê cezaya tund bi ser Îranê de bisepîne û welat rastî kirîzeke kûrtir bike.

Îran wekî bingeha terorîzmê û serekaniya hizrî û madî ya vê berçaviyê wek kite çeka xwe û lahêza givaşê ji bo parastina xwe û cî bi cî kirina armacên siyasî û îdeolojîk yên xwe bi kar tîne. Bo mînak, Îran rasterast û ne rasterast di welatê Îraqê de terorîzm û netenahiyê xurt dike, vê siyasetê jî bi du armancên sereke dişopîne: Yekem, çeqandina Amerîkayê di wî welatî de, bona vê çendê ku nekare li ser Îranê bifikire û ew cerbînên ku dixwaze li Îranê cî bi cî bike, rastî têkçûnê bîne. Armanca duyem ku heta qasekê pêwendî bi heman merema yekem ve heye, xurtkirina pirgirêka qewmî û olî wekî teqîna Samerayê yan terora Mihemed Baqir Hekîm, eva cuda ji vê çendê ye ku rejîmê bo ji holê rakirina neyarên siyasî û jarkirina opozîsyonê jî pir caran bi vî awayî bi kar aniye ku em Kurd ji goriyên sereke yên vê siyaseta qirêj û nemirovane ya Komara Îslamî ne.

Demokrasî çi wekî sîstem û çi wekî kultur, bi tevahî tevî bingehên Komara Îslamî ya Îranê dij û natebah e. Demokrasî weke sîstema parvekirina desthilatê, piloralîzm, azadiya hilbijartinan, hebûna derfeta cih guhertinê di desthilatê de, azadiya raderbirînê, desthilata gel û qanûnê bi giştî tevî sîstema totalîter, munolog, take partîtî û dîktatoriyeta Komara Îslamî dijber û nenas e. Di warê kulturî jî tu yek ji xasmaniyên demokrasiyê yanî hebûna ruha xwegorî kirinê, bi hev re bûn, pejirandina cudahî û xwesteka azad di desthilata Komara Îslamî de nahê dîtin. Lewra pêvajoya demokratîzasiyonê ku niha hemû cîhan û nemaze Rojhilata Navîn bi xwe ve girtiye, rûyê veguhartina wê ber bi welatên dîktatorlêdayî weke Îranê ye. Rejîmek ku heta hebûna Tekiya Dewrêşên "Nemet Elahî" li Qomê pê nahê qebûlkirin û wan dihilweşîne, çawa dikare xwe tevî pêvajoya demokratîzasiyonê rê bixe.? Karwanê demokrasiyê di rê de ye û yê bûye axiv û mijara hakim ya civaka navneteweyî û Îranê jî. Lewra di serdemê cîhanîbûnê û gundê cîhanî de, teoriya pêkanîn Giravek ji paşverûyî û dîktatoriyê ji aliyê rejîmê ve pitir weke xeyalek pûç û vala diçe.

Yek ji bûyerên herî girîng yên sala borî di Îranê de, hilbijartina Mehmûd Ehmedînejad ji bo posta Serok Komariya Îranê bû. Piştî vê çendê ku ji bo heyamê 8 salan binav Reformxwazên rejîmê bi serokatiya Mihamed Xatemî, bîr û raya giştî ya gel û cîhaniyan bendewarê pirsgirêka guhertinên kartonî di Îranê de kir û li pey vê yekê ku him ji bo xelkê Îranê û him civaka navneteweyî bê mifahî û bênaverokiya wê senaryoyê ron û zelal bû, xelkê Îranê bi giştî û nemaze gelê Kurdistanê rêya baykotkirina hilbijartinê girte pêşiya xwe. Lê rejîmê ji bo man û hebûna xwe û mifah wergirtin ji tev fend û fêlekê bi hilbijartina terorîstekî tundrew weke Mehmûd Ehmedînejad xwe ji bo berbirûbûn bi qonaxeke nû re amade kir. Ehmedînejad her ji destpêka hatine ser kara xwe, xebitiye li gor dîtin û nêrînên xwe serdemê şoreşê vejîne û ser li nû tund û tûjî, serkût û perçiqandinê pêtir ji salên çûyî jî bi ser xelkê de hakim bike. Tepeserkirina serhildan û kuştina xelkê Kurdistanê di havîna derbasbûyî de, qirkirina serhildanên xelkê li Ehwazê, qedexekirina rojnameyan, girtina rewşenbîran û rojnamevanan, serkutkirina girevgirtin û xwenîşandana aram ya kedkarên Şîrketa Ajotonê bi awayê herî hov, tepeserkirina xwenîşandanên li bajarê Makû, kuştina sedan kes ji kasibkarên Kurdistanê di bin navê berevanîkirin ji qaçaxê û nimûneya herî nû jî êrîşa hêzên tepeserkar yên rejîmê bo ser

www.arsivakurd.org

civîna jinan bi hinceta rêzgirtin ji Roja Cîhanî ya Jinan di roja 8'ê Marsê li Parka Xwendekar a li Tehranê û hwd..., mînakên siyaseta şerxwaz ya Ehmedînejad in. Eva serbarê wan şaşî û çewtiyên siyasî ne ku Serok Komarê rejîmê weke destegul di avê de berdane û Îran di dunyaya derve de pêtir dûr xistiye û ev ramane di bîr û raya giştî ya cîhanê de xurt kiriye ku rejîma Îranê tirseke mezin bo ser aştiya cîhanê ye.

Kurdistanê di sala borî de salek tejî pirsgirêk û bûyer derbas kir. Serhildanên seranserî yên havînê û serhildana vê dawiyê ya bajarê Makû û çend bajarokên derdora wê, hilgirê peyameke herî girîng in. Bilindbûna asta hişyariya neteweyî ya Kurd û têgihîştina wan ji maf û rewşa wan ya niha ji aliyekê yê bûye sedema hilbûna geş a xebatek gelî û ji aliyek din jî rewşa Kurdistana Îraqê û rola Kurdên vî parçeyî ji Kurdistanê di diyarîkirina çarenivîsa xwe de û beşdariya wan li hikûmeta nû ya Îraqê de, ev guman û şike verevandiye ku serkevtina Kurdan û serbestiya Kurdistanê ne mimkun û xewn û xeyal nine. Çaxekê ku em dibînin Kurdistanê hikûmeta xwe heye û Pêşmergeyek serokatiya wê dike, demekê ku em dibînin Serok Komarê Îraqê Pêşmergeyekî rojên dijwar yên xebatê ye, agirê hêviya Kurdên parçeyên din jî bi serkevtin û serbetiyê gurtir dibe, lewra weke me dît ku xelkê Kurd bi wêrîneke zaf ve di havîna îsal de li Mehabadê hatine ser rêgehan û pişta rejîmê xistin lerizînê. Ji vê çendê girîngtir ewa bû li pey Mehabadê, xelkê bajarên din yên Kurdistanê jî ji bo nîşandana hevdengiya xwe tevî xwîşk û birayên Mehabadî yên xwe, li Şino, Sine, Seqiz, Pîranşar, Merîvan, Serpira Zehaw, Pawe, Kamyaran, Kirmaşan û Bokanê jî hatine ser rê û şeqaman û rûpeleka din ya zêrîn ji hevgirtin û xebata mafxwazane ya neteweya xwe bi dîroka vî gelî zêde kirin.

Her çiqas rejîmê piştî qirkirina xwenîşanderan û girtin û kuştin û bê ser û şûn kirina wan, bawer dikir derbek wisan xistiye ku Kurd fikrê ji serhildanê nake, lê agirgeha Kurdayetî û azadîxwaziyê dîsan û vê carê di bênan û seqema zivistanê de, li çiyayê Agirî û li bajarê Makûyê serî hilda û Kurdan selimandin ku **tu hêzekê karîna têkşikandina vîna wan nine**.

Heke em lênêrîneke bilez li rewşa siyasî, aborî, civakî ya xelkê Kurdistanê bikin, bi hêsanî ji me re xuya dibe ku neteweya Kurd di vî para Kurdistanê de, li çi rewşeke nebaş û ne jêhatî de dijîn, nebûna civaka medenî(sivîl), azadiya siyasî û demokrasî, siyaseta helandina Kurd, binpêkirina hemû mafeke mirovî û neteweyî, giranî, riziyoka gişt alî, bêkarî, jarî û xizanî û zêdebûna komek pirsgirêkên civakî weke îtiyadê, civaka Kurdistanê yê gihîjandiye asta teqînê. Evane ji aliyekê û ji aliyê din jî bilindbûna asta hişyarbûna neteweyî û jorde çûna pileya daxwazên berheq yên neteweya Kurd, rewşeke hêja û jêhatî ji bo xebata neteweyî û serhildaneke gelî pêk aniye ku li jor me qala çend nimûneyên berçav yên wê di sala çûyî de kir.

Wekî me bas kir û ji bûyerên van çend salên dawî yên Kurdistanê, Îranê, herêmê û cîhanê re xuya ye, pêşeroja serkevtinê gelek ronahî ye û weke çawa bihara xweziyê li berahiya me ye, bihara azadî û serkevtinê jî yê nêzîk bûye. Hewceye ji hemû demekê pêtir em tebayî û hevgirtina xwe biparêzin û bi mifah wergirtin ji waneyên demokrasî û netewexwaziyê, gavên dawî yên serkevtinê bi qahîmî bavêjin.

PDK Îranê di vê roja neteweyî de, soz û peymanê tevî we nû dike ku heta roja azadiyê û gihîştin bi bilindiya serkevtinê qet dest ji xebatê ber nade û ji bo demekê jî dest ji cehd û hewildanan di vê derheqê de hilnagire. Em li wir pişgirî û hevdengiya xwe bi gişt xwenîşanderan, girevgirtiyan, girtiyên siyasî, malbatên şehîdan û tev xelkê Kurdistanê didin xuya kirin û tevî eyankirina spas û pêzanîna xwe ji bo hemû xebat û xwegorîkirina we, di vê cejna neteweyî de, em peymanê bi we re nû dikin ku hetanî qonaxa dawî ya azadî û serbestiyê, em dê bi we re bibin û ji bo demekê jî dest li nava destê Kurdistanê û we jî bernadin.

Dîsan Newroza pîroz be

Bi hêviya wê rojê ku Kurdistanek serbest de, em bi hev re cejna Newrozê û azadiyê pîroz bikin.

---

Peyama Newrozî Ya Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê, Rêzdar Mistefa Hicrî

## "Em bi vê hêvî û xweziyê pê davêjne sala nû ku Newroza îsal her tenê nûbûna sale nabe, belkî destpêka saleke nû ji guhertinan ber bi azadî û serbestiyê jî bibe"



**Hevwelatî ên hêja!**
**Gelê Xebatkar yê Kurdistanê!**

**Beşdarên şahiya Newrozê!**

Newroz, nûbûna xwezayê, cejna kevnar ya Kurdan ji hemû neteweya Kurd ku li her cihekê bin, ji xelkê Îranê û ji we Kadro û Pêşmerge, endam û alîgirên PDK Îranê pîroz be.

Li sala borî de xebat û berxwedanî dijî dîktatorî û serberedayiyê dom hebû û binpêkirina mafên mirovan berdewam hate meşandin, rejîm tev komplo û tund û tûjiyek ji bo serkut, çewisandin û bi çokde anîna xelkê bi kar anî, lê ji bilî rûreşî û bê encamiyê çi din jê re nemaye. Heta diyarîkirina kesek wekî Mehmûd Ehmedînejad û dewleta polîsî û ewlekariya wî jî nekarî tiştekî ji meseleyî biguherîne.

Di asta seranserî de dîsan qedexekirina belavok û rojnameyan, xwenîşandanên xwendekaran, tund û tûjtir ji salên çûyî berdewam bû. Di vê derbarê de dijberî kirin û mafxwaziya kedkar û rêveberên Şîrketa Ajotina Otubosan li Tehranê û neyariya jinan cihê taybetî li xebat dijî rejîmê û mikumbûn ji bo bidestveanîna mafên xwe tomar kirin.

Ewa ku em dikarin derheq têkoşîna neteweyên bindest di heyema sala 1384'an de, di vê derfet û delîveyê de îşare pê bikin, xurtbûna zêdetir ya seha neteweyî, hişyarî û zanebûna bêtir li ser mafên xwe yên berheq û xwegorîkirin bona bidestveanîna van mafane bûn. Di vê çarçoveyê de hewce ye em qala xebat û berxwedaniya xelkê neraziye Ereb yê Başûr bikin. Her çiqas di wê xebata berheq de sedan kes ji xelkê bêpar û bindest yê wê herêmê hatine şehîb, birîndar û zindanî kirin, lê xebata wan her didome.

Kurdistana me ya delal û xweştevî jî bi dirêjahiya sala derbasbûyî qada berxwedanî û xebata xelkê şoreşvan û netis yê Kurdistanê, nemeze ciwanan dijî kirêgirtiyên Komara Îslamî ya Îranê bû. Gelê Kurd li seranserî axa Kurdistanê de, li Îlam heta Makûyê dehan liv û meşên nerazîbûnê yên biewle dijî kiryar û kirinên rejîmê lidarxistin û daxwaza mafên xwe yên siyasî û civakî kirin, lê bersîva daxwazên van bi serkut û tund û tûjiyê hate dayîn û dehan kes jê hatne şehîd kirin û sedan kes birîndar bûn û li girtîgehên reş û tarî yên rejîmê hatne xistin, yan ji ax û şûn û warê xwe hatne dûr kirin.

Fedakerî û berxwedaniya neteweyên bindest yên Îranê, nemaze neteweya Kurd di dema sala derbasbûyî de, ji hemû cîhanê û desthilatdarên Komara Îslamî re xuyand ku ev xelke amade ye hemû gorîkirinekê bide, lê ji xwestek û daxwaza xwe ji bo bidesveanîna mafê demokratîk û berheq yên xwe paşde nekişîne. Rejîm jî gelek ji vê çendê rebentir e ku bişêt bi tund û tûjiyê xelkê bitirsîne.

Di vê hinceta pîroz de, em silavan dişînin bo canê paqij yê hemû van keç û kurên canbextkar û şoreşvan ku di rêya rizgarî û azadiya gelê xwe de jiyana xwe ji dest dan. Silav û peyama sozdarî û hevpêwendiyê ji bo wan qehrimanan ku îşkencaya hovane ya kirêgirtiyên rejîma nezanî û tarîtiyê pişta wan neçemandiye û niha jî di girtîgehan de sirûda azadiyê dibêjin û hazir in ku bihar, ronahî û hezkirinê ji bo gelê xwe wekî cajnane bînin.

**Lê hevwelatî yên rêzdar!**

Salek ku niha me hembêz ji bo vekiriye û diçin pêşwaziyê wê(sala 1385'an), avisê gelek bûyer û guhartinan di Îranê de ye. Piştî nêzîk bi 28 salan terror û piştevanî kirin ji

www.arsivakurd.org

terorîzmê, derew kirin tevî xelkê Îranê û cîhanê, binpêkirina mafên mirovan, dijberî tevî aştî li herêmê û maytêkirin di di kar û barê hundirê welatan û li serveyî tevan kar kirin û mikûmbûna rejîmê li ser domandina projekta Etomî ku armanca wê ya dawî û bingehîn çêkirina çekên Etomî ye, aqibet mijûl e dunya û nemaze Rojava dijî ew hikûmeta biyom û serberedayî yekdest û hevgirtî dike.

Pêvajoya bûyeran ber bi vê çendê diçe ku di vê salê de Komara Îslamî ya Îranê bi mêjiyek kevn û siyasetek berê û bi komek kirîz û pirsgirêkên nû yên hundirîn û derveyî re, bikeve ber dijberiya micid tevî xelkê vêzar û azadîxwaz yê Îranê li hundir û cîhana pêşketî di asta navneteweyî de. Bêguman di vê dijberiyê de aliyê têkçûyî û torandî rejîm e û em guneha amadekarî kirina wê dijberiyê û encamên ne çavnihêrî kirî yên nexweş ji bo xelkê Îranê, dixin stûyê rejîma Komara Îslamî ya Îranê. Em dibêjin gelê Kurd û hemû gelên din yên Îranê azadî, aştî, şabûn û bexteweriyê dixwazin û ji şer, dîktatorî û paremayiyê ku berhema zêdetir ji çarêka sedsalekê ya desthilata vê rejîmê ye, vêzar in.

**Hevwelatî ên hêja!**

Di vê dijberî kirinê de em wekî gelê



*Wêneyek ji beşdarên şahiya Newroza 2006'an , li binkeya Deftera Siyasî ua PDK Îranê*

Kurd û partiya wê ya pêşeng, PDK Îranê wek hergav di êniya azadî, demokrasî û aştiyê de ne, lewra wezîfa ser milê me ye ku bi amadebûna zêdetir û baweriya qahîmtir, hevalbendî tevî neteweyên din û cîhana pêşverû vê dijberiyê bidomînin, heta wê dema ku em siya giran ya vê rejîmê li ser xwe û gişt cîhanê ji holê rakin û hikûmeteke hilbijartiya gel li cihê vê ava bikin. Xuya ye di vê xebatê de hemû şêrejin, xwendekar, kedkar, ciwan û bi giştî tev tex û qatên hişyar û zana yên welatê me bi me re ne û ya ku bêtir jî jar dibe, Komara Îslamî ya Îranê dibe. Di vê xebet û dijberiyê de serkevtin ji bo gel û neman ji bo dijî geliyan e.

Em bi vê hêvî û xweziyê pê davêjne sala nû ku Newroza îsal her tenê nûbûna sale nabe, belkî destpêka saleke nû ji guhertinan ber bi azadî û serbestiyê jî bibe.

Lewra cejna Newrozê û sala me ya nû pîroz û dê bibe sala bidesxistiyên bihagiran.

Hemû rojên we Newroz û Newroza we pîroz be

# Demokrasî, Biha Û Piratîka Wê

**Beşa 24**

Kurmanc Hakkî
kurmanchakki@yahoo.com



**Berhevdana giştî**

Di beşa berê da hate gotin ku vekirîtiya ûtîralîzmê ji bo baştir bûna encamên biryarê desthilatdarin. Ew encame jî girêdayî bi wê yekê ne ku heta çiqasî li mafê xwe ji bo bidestveanîna zanyariyan li ser biryar û hegerên biryara desthilatdaran çalak in û her wisa bi seha berpirsiyariya biryarderan hatiye girêdan, ku çiqas bi soz û peymanên xwe wefadarin. Di vê beşê de em dê felsefeya exlaqî ya Kant û teorî ya Habermas şirove bikin.

**Felsefa exlaqî ya Kant wek bingeha demokrasiya delîberatîv**

Li gor teorîzanên demokrasiya delîberatîv bingehên biryarên siyasî divêt li ser xîmê *otonomî* û *yeksaniya* navbera mirovan û *gotûbêj û diyalogek jîrane û rasional* bê damezrandin. Merem ji yeksaniya mirovan rêzgirtina wekhev li hemû endamên civakê ye bi wê awaya ku li teoriya Beitz de li beşên derbazbûyî hatiye bas kirin. Otonomî bi wateya serxwebûna mirov li lêkwedan û hizir kirin û biryardanê tê. Gotûbêj û diyaloga jîrane û rasional jî bi wê wateyê tê ku takekes dikaribin û ew maf û erkane hene ku qezawetê li ser argûmêntên hatî kirin bikin.

Li felsefeya exlaqî ya Immanuel Kant (1742 – 1804) de bi awayekî herî baş bingehên demokrasiya delîbratîv tê dîtin. Destewajeya navîn ya felsefeya exlaqî ya Kant *erk (wezîfe)* ye, ku li gor wê karên ku dibe bên kirin, divêt li ser bingeha rehaye (mutleqe) fermanê hatibe damezrandin. Mirov divêt tenê wan karana biket ku di çarçoveya exlaqî ya hizra wî de bihê pesend kirin. Bo nimûne bicî negehandina soz û peyman bi wateya bê exlaqiyê tê, ji ber ku bicî neanîna peymanan dibe sedema ji nav birina baweriyê û di dawî de mirov bi xwe, xwe ji nav dibe.

Ger mirov erka xwe bi cih bîne û wefadar bi bingehên exlaqî be, em dikaribin bibêjin ew otonom e. Hevgirtina mirovên otonom dikaribin bi *padîşehên armancê* bên linavkirin. Ew desteya han dibe sebebê pêkhatina *niyeta baş* ji bo armanca mirovanetiyê û rêzgirtin ji mirovayetiyê wek armanc, ne wek alavk ji bo gihîştin bi armancê lê tê. Felsefeya exlaqî ya Kant berî ku bi rastiyên exlaqî bê pesin kirin, dikaribe bi îdealên exlaqî bên nas kirin.

Hewce bi baldanê ye ku *giştîbûn* bi hizra Kant curek ji ezmûna bicihanîna exlaqî ye. Di pirtûka *Aştiya Hergavî* (1975/2000) Kant dibêjê: "Ew karên ku pêwendî bi mirovan hebe, şaş e ger li ser bingehekê hatibe damezrandin ku bi eşkere bas jê neyê kirin." Kant hizra eşkere bêjiyê bi *Ezmûna jîrîtiya paqij* linav dike, ku divêt ji bo hemû wan biryar û kar û qirarên ku pêwendî bi jiyana mirovahiyê heye berxwe bigire. Li dîtingeha siyasî de armanca Kant li Ezmûna jîrîtiya paqij ewa ye ku ew biryarên siyasetvan û biryarderan ger sebeb û bingeha wan bi eşkere nehê bas kirin, şaş e. Çunkî biryarên eleqedar bi mirovan û welatiyan divêt li ser bingehên aqilanî damezrabin ku biryarder bikaribin di nav civakê de berevaniyê jê bikin.

Hizra Kant û argûmentên ûtîralîzmê di vê derheqê de bo berhevdanê dibin. Ji ber ku li gor ûtîralîzmê, ger eşkereyî encamek baştir li nihênîtî û nepeniyê hebe, vekirîtî tê pêşniyar kirin. Di hember de bi hizra Kant vekirîtî di biryaran de wek eslek deontolog e. Bi wê wateyê ku heke biryarên ku tên dan, exlaqî ne tu hegerek bo veşartina wan biryarane yan hegerên wana namîne û ew biryarane û biryarder divêt şiyana eşkerebêjî û vekirîtiyê bê tirs hebin. Di wê mêzegehê de argûmênt û hegera ber base Kant ji bo vekirîtiyê (şefafiyetê) bihêztir li hegerên ûtîralîzmê ye, her çend hegerên biryardanî ne hewceye, ji ber hizr û ramanên bi sedema vekirîtiyê rexne hatî kirî nabe zû teslîm bin. Wek antî têza wê yekê mirov dikare bêje ku argûmenta eşkerebêjiya Kant bi jariya hizra wî ye. Ew argûmênta han dibe hegera wê yekê ku mirov bo nimûne pirsyara jêrîn li xwe bike: "Erê gelo ew siyaseta min hilgirtiye dê bikaribe taqeta bîr û raya giştî bîne?"

Di hizra xwe de Kant ne tenê ye. Hizrên "John Rawls" û "Jürgen Habbermas" gelek hevgirtinên hizrî tevî Kant hene. Her du alîgirên hizra yeksanî û otonomiya takekesane û her du jî piştgiriyê li vekirîtiya dîbat û basên normatîv dikin. Hizra exlaqî ya Kant dibe hegerê wê yekê ku di demokrasiya dêlîberatîv de hizr û raman û biryarên siyasî bi awayekî berfireh bikevin ber berhevdanê.

Di ramanên Habermas û Raws de her wiha hinek cudahî jî tevî hev hene li ser demokrasiya delîberatîv. Rawls nûneratiya Lîberala Anglo Amerîka dike,

[1] communication, pêwend, ارتباطات [2] سخنرانی

www.arsivakurd.org

di hember de Habermas alîgirê mekteba rexnegire Firankfortê ye. Konstraktîvizma (sazane) Rawls tenê pêwendî bi yasayên jiyana siyasî hene, lê teoriya Habermas hemû tiştan derbarê heqdariya dîtin û argûmentan de di ber xwe digire. Di teoriya wan da her wisa nêzîk bûn û naskirina demokrasiya delîberatîv cuda ye. Alîgirên Rawls ser mijara çewaniya mifah wergirtina takekes ji mafên xwe li hizra demokrasiya dêlîberatîv radiwestin. Her wisa Rawls û alîgrên wî li ser mijara çend alîtî û firerehendiyê li demokrasiya dêlîberatîv û çareserkirina pirsgirêk û konfilîktan di wê sîstemê de kar kirine. Bi hizra Habermas arîşa niha ya demokrasiyê tevlîheviya civaka nû ye, ku dibe hegera giran kirina basa demokratîk û hizr û berhevdana mirov.

**Teoriya li ser bingeha komûnîkasyona Habêrmas**

Li berhemên berfireh yên "Jûrgen Habermas" de, li ser mijara demokrasiyê ya ku rola herî navîn û berçav digêre teoriya wî li ser *teoriya komûnîkasyona*[1] *bikare* û têgihîştina wî li ser ravekirina vekirî ye di demokrasiya li ser bingeha nûnerayetiyê (dêlîberativ)de. Bingeha teoriya komûnikasyona bikar li ser rast û dirust bûna wan faktên ku tên ber basa biryarderan (validate) û her wiha rastiya basên pêwendîdar bi pêşveçûnê hatiye damezrandin. Cudahiya teoriya Habêrmas digel Rawls li ser pênase kirina *dadperweriya siyasî ye*. Ku di vê derbarê de teoriyên Habêrmas bi armanctir û girantir in.

Bi awayekî sakar em dikaribin êtik (exlaqa) dîskursa yan êtika guftigûya Habermas bi awayê jêrîn bidin nas kirin: Destewajoya gelek giring û berçav di wê teoriyê de komûnîkasyona îdeal wate dema axaftinê[1] ye. Sirûşta komûnîkasyona îdeal di wê de ye ku diyalog li ser bingehek rasiyonal û otonomiya exlaqî ya takekesan hatiye damezrandin. Li komûnîkasyona îdeal de aliyên guftûgo û diyalogê yeksan û serbest in li giranî dan bi pirsgirêkan. Her wisa merc bo diyalogek dadperwerane bo hemûyan wekhev e. Her wiha li komûnîkasyona îdeal de aliyên komûnîkasyonê rasiyonal in, bi wê wateyê ku ewa ku dikeve berbasê nek takekes, belkî ew babeta ku ji aliyê takekesan dikeve rojevê, pirsa berbas û diyalogê ye. Nirx û cihê baweriya argûmêntên ber rojeva axaftinê li gor belge û heger û faktên babetê tên diyar kirin. Di rewşek wilo da giring ew kesê babetê pêşkêş dike nine, giring ew babete ye ku dikeve rojevê.

Li gor Habermas di biryarên demokratîk de cihê bawer bûn û exlaqî bûn yan lêgitmîsiya basên hatî pêşkêş kirin, berî hert tiştekê tê. Babetên cihê baweriyê ew babet in ku hemû aliyên diyalogê di dema baskirinê de, rastiya wê qebûl bikin.

Encama komûnikasyona îdeal dikaribe konsênsûs an hevdengiya tev aliyên beşdar di diyalogê de be. Bi vî awayî guherîna babetên ber basê bi xalên normatîv dikaribe bi komûnîkasyona îdeal bê nas kirin. Merca gehiştin bi konsênsûsê di komûnîkasyona îdeal de ewên xwarê ne: Axaftinkar û beşdarên diyalogê peyv û pêvajoyên havbeş û hevwate bi kar bibin. Ew argûmênt û konsênsûsa pêkhatî li ser bingehê şaşiyan pêk nehatibe.

Li gor wan mercên serê hatî nîşan kirin, Habermas (1996) mînaka lêgîtmasiya (yasayî bûna) biryara demokratîk dikişîne: Li gor wî biryarên demokratîk demekê yasayî ne ku em bizanibin ta çi radeyekê mercên komûnîkasyona îdeal cî bi cî kirine. Bi vî awayî teoriya Habermas hin mercên taybetî ji bo diyalogên demokratîk datîne ji bo pêkhatina berhevdana giştî: Hemû welatiyan divêt şansê adilane hebe li beşdarî kirin di bas û dîbatên giştî û vekirî de. Ew her wisa îdeala xwe ji bo beşdarîkirin li diyaloga vekirî de dide diyarî kirin: Welatiyê ku beşdariya diyalogan dike, divêt rastiya argûmêntan tenê li ser bingehê exlaqî bûn û mentiqî bûna wan berhev bide. Li gor wî, raya giştî girêdayî bi rasiyonal bûna komûnîkasyonê û beşdariya dadperwerane ya welatiyan e.

Bi dîtina Habermas yasayî bûna biryarên siyasî bi wê girêdaye heta çi qas diyalog û rasiyonalîzma komûnîkasyonê hatiye parastin.

Dom li hejmara tê de.

# Şahiya Newrozê Li Binkeya Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Hate Pîroz Kirin

**Agirî:** Êvariya roja duşem, 29'ê Reşemeya 1384'an ya Rojî(20.03.2006), di rê û resmeke berfireh û hêja de şahiya cejna Newrozê di Fêrgeha "Siyasî-Nîzamî" a PDK Îranê û bi pişikdariya endamên rêberî û bi sedan kes ji Kadro û Pêşmergeyên partiyê û mêvanan hat pîroz kirin.

Rê û resm bi sirûda "**Em rojî salî taze ye Newroze hatewe**" ji aliyê Koma Hunerî ve dest pê kir. Piştre birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Partiyê, Peyama xwe ya Newrozî pêşkêş kir. Birêz Hicrî di peyama xwe de îşare bi bizavên nerazîbûnê di Kurdistanê û Xozistanê de û her wiha gireva nerazîbûnê ya karkerên "**Şirketa Wahid**" û çalakiyên berbiçav yên xebatkarên tevgera jinan di Kurdistan û Îranê de kir û sala rabihorî bi saleke pir destkevt zanî ku têde seha neteweyî a gelên bindest yên Îranê bi awayekî balkêş û berfireh xurt bûye.

Her wiha birêz Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, di peyama xwe de, îşare bi hilbijartina Mehmûd Ehmedînejad û kabîneya ewlekarî û leşkerî ya wî û tepeserkirina pitir a azadîxwazan û riftarên neberpirsane yên rejîmê di asta navneteweyî de bi taybet li ser bernameya çekên Etomî kir û sala borî bi salek ku serberedayî û dîktatoriya rejîmê bi asta herî bilid a xwe gihîştiye, da zanîn.

Di beşek din a peyama xwe de, rêzdar Mistefa Hicrî geşdîtina xwe bi nisbet sala 1385'an a Rojî da eyanê û hêvî xwast ku di vê salê de neteweya Kurd û neteweyên din yên Îranê bi armancên berheq yên xwe anku **azadî, demokrasî û bidestveanîna mafên neteweyî** şad bin.







## Tevîlbûna Hunermend Tahir Xelîl Û Çiya Mamlê Coş Da Şahiyê

Her du hunermendên dengxweş, Tahir Xelîl û Çiya Mamlê tevlî şahiya Newrozê û cejna sersala nû bûn. Hunermend **Tahir Xelîl** bi sirûda bi nav û deng a xwe "**Le Qendîlî serberzewe**" coşek germ da rê û resmê û dilê beşdaran şad kir. Her wiha hunermendê ciwan, **Çiya Mamlê** bi stiranên xwe rê û resm xemiland.

Her li doma rê û resmê de birêz Mistefa Hicrî agirê Newrozê hil kir û piştre **Koma Govenda "Rojhelat"** bi pêşkêş kirina çend dawet û govendên folklorî rê resm xemilandin. Dawiya cejna Newrozê bi dîlan û xweşiyê dawî pê hat.

www.arsivakurd.org

# Bandora Îranê Li Ser Rewşa Siyasî Ya Îraqê

***Selîm Zencîrî***

Digel bihorîna pitir ji 3 salan li ser destpêbûna şer û hiloşîna rejîma Bees û nêzîk bi 4 meh li ser hilbijartina Civata Niştimanî ya Îraqê, lê hêj şer û pêvçûn, teqîn, kiryarên terorîstî û rehîngirtin û wd... di Îraqê de her didomin. Ji aliyekî din jî dijayetî û hevrikiya hêzên siyasî û aliyên serkevtî di hilbijartinê de, kirîz û aloziyek mezin di Îraqê de afirandiye. Ev çende yê bûye kosp û asteng li hember pêkhatina hikûmeta nû. Rewş bi qasekê aloz e ku hertim îmkana serhildana şerê navxweyî û parvebûna welat heye. Gutûbêj û dîskorsa di navbera nûnerên desthilatdar di Îraqê de kêmtir û dijwartir bûye. Kiryar û çalakiyên terorîstî cuda ji Îraqê, di cîhanê de jî zêdetir bûne û cehd û têkoşîna hêzên hevalbend bi serokatiya Amerîka bo gehîştin bi encamek erênî, cihgîrkirina aramî û tenahiyê û her wiha rizgarbûn ji rewşa nihoyî di Îraqê de ketiye ber tirs û xeterê.

Bi giştî em dikarin îşare bi 3 sedemên bingehîn ku di têkdana rewşa Îraqê de karîger û bibandor in, bikin:

1. Hebûna endamên Bees yên wefadar bi Sedam Husên
2. Hebûna girûpên terorîstî û tundrew bi piştevaniya Îranê
3. Desttêwerdana welatên cîran di kar û barên hundirê Îraqê bi taybetî dewletên Îran û Sûriyê.

Li gor agahiyên çapemeniyan, sedemên bingehîn ku bûne kosp û asteng li ser rêya serkeftina prosesa siyasî û direng pêknehatina hikûmeta nû di navbera aliyên serkevtî di hilbijartinê de, yên jêr in: Li ser kar hilgirtina Ceferî li ser daxwaza Hevalbendiya Kurdistanê û Sunniyan, pirsa Federaliyê, pirsa Kerkûkê(mada 58'an) û her wiha kêm kirina desthilata Serok Wezîr.

Di vê navberê de çendîn caran tiliyên tawanbariyê bi terzekî berfireh, piştî hiloşîna rejîma Bees, ji aliyê Amerîka, Birîtaniya û hin welatên Erebî ve bi meytêkirin di kar û barên Îraqê bo aliyê Îranê hatiye dirêj kirin. Îran bi dest hebûn di terora çend berpisiyarên Îraqê û piştevanî kirin ji girûpên terorîstî hatiye gunehbar kirin, lê niha şîdet û rijdiya van êrîş û tawanane di rewşeke wiha hesas û dijwar a Îranê û di asta navneteweyî de, yê bûye sedema vê yekê ku ev pirse bibe bi mijarek girîng û balkêş di rojeva cîhanê de. Vê mijarê alîkariyek zaf û xurt da bîr û raya wan kesan ku li ser vê baweriyê ne Komara Îslamî dixwaze rewşa Îraqê aloz û bi qazanca xwe biguherîne û bandora xwe li ser guhartinên siyasî ji rêya mizextina pareyek zaf û hinartina bi hezaran kes ji



*Îran piştevanî û alîkariya girûpên terorîstî li Îraqê dike, çek û teqemeniyan bo nava Îraqê dişîne*


alîgirên tundrew yên xwe bo Îraqê dabinêt. Ji aliyê din serkevtina hevalbendî û hêzên Şîî yên alîgir û emegdar bi rejîma Îranê di hilbijartina vê dawiyê û tekrewiyên Ceferî, şik û gumana ku Îran di cehda pêkanîna hikûmetek mesebî, mîna xwe û emegdar bi xwe di Îraqê de ye hebe, xurtir kiriye.

Komara Îslamî bi karnameyeke reş di heyamê 27 salan desthilatdariya xwe de çi di asta hundirîn, çi herêmî û çi jî navneteweyî de, niha rastî kirîz û astengan hatiye. Ji aliyê civaka cîhanî û nemaze Rojava ve li ser xebat ji bo bidestxistina çekên Etomî ketiye bin zext û givaşeke zaf. Lewra rejîm ji bo rizgarbûn yan kêmkirina van zextane penayê bo her tiştekê dibe. Bi teybet eva ku dezgeh û saziyên ewlekarî yên Îranê ji ceribînên şerê 8 salî di navbera her du welatan de bi başî haydarê rewşa Îraqê ne û dikarin beşdarî û roleke nerênî a bihêztir di Îraqê de bilîzin û di desttêwerdan û alîkarî kirin bi gerupên terorîstî, tundrew û neyarên prosesa aştî, demokrasî û tenahiyê di Îraqê de destvekirî be.

Her di vê çarçoveyê û li ser û bendê pêkhatina civînên Konseya Ewlekarî a Neteweyên Yekbûyî ji bo nirxandin û pejirandina biryarnameyekê bi dijî Îranê li ser dosya Etomî, Amerîka dixwaze civaka cîhanî dijî Îranê yekgirtî û hevdeng bike. Lewra vê carê Bûş rasterast rejîma Komara Îslamî di kiryarên terorîstî û li kuştina serbazên Amerîkayî di Îraqê de tawanbar kir û daxuyand ku Îran çek û teqemeniyan dide terorîst û neraziyan û rejîma Îranê bi gefek mezin bo ser Amerîka û xelkê wê hesiband.

Her wiha Birîtaniyayê jî Îran bi êrîşên dijî hêzên Birîtaniyayî de gunehbar kir û da zanîn ku Îran piştevanî û alîkariya girûpên terorîstî mîna **Hizbula, Sipaha Mehdî** a ser bi Melayê tundrew yê Şîî, Muqteda Sedr, **Ensar El Sune** û **Sipaha Qodsê** dide. Her wiha Birîtaniyayê Îran bi bazerganî û qaçaxa çek û teqemeniyan bo Îraqê û hînkirin û elimandina terorîst û neraziyan tawanbar kir.

Di heman demê de Îranê jî, Amerîka û Birîtaniya bi haydan û harîkariya neraziyan û bi desthebûn di pevçûn û bizavên nerazîbûnê yên îsal di Kurdistan û Xozistanê de gunehbar kir û disan jî tekez li ser derketina hêzên leşkerî yên biyanî li Îraqê de kir. Îran îdeayê dike ku divêt dagîrker bi derketina xwe li Îraqê û spartina rêveberiya welat bi xelkê, derfetê ji bo pêkhatina tenahî, aştî û demokrasiyê di Îraqê de pêk bînin. Bê guman armancên bingehîn yên Komara Îslamî ji destêwerdan di kar û barên hundirê Îraqê di gava yekem de, kêmkirina zext û givaşên cîhanî li ser xwe li dor programên navikî yên xwe ye. Duyem, sergêjî, bendewar û mijûl kirina Amerîka û hevalbendan bi pirsên Îraqê ji bo manordana pitir a xwe. Sêyem, piştevanî û avakirina hikûmetek nû bi desthilatdariya Şîiyên cihê baweriya xwe. Çunkî Şîeyên tunrew û malbata Elhekîm berê jî ji siyasetên Komara Îslamî bi dijî Sedam Husên piştgîrî dikirin û piştî nemana rejîma Bees jî, heta niha li bin kargeriya siyasetên Îranê de bûne û çendîn caran jî tawanên ku rastî Îranê li dor maytêkirin di kar û barên Îraqê de dahatin, red û bê bingeh hesibandine.




*.Armanca Îranê alozkirina rewşa tenahiya Îraqê ye û dijî prosesa azadî û demokrasiyê di Îraqê de dixebite.*

Bi giştî şîdet û pitir bûna êrîşên terorîstî li Îraqê, rewşa siyasî ya aloz, îmkana çêbûna şerê hundirîn, pêknehatina hikûmeta nû, tekrewî û pêrewiya hevalbendiya Şîî ji siyasetên Îranê û ji hemûyan girîngtir îmkana pêkhatina hikûmetek olî li bin tesîr û bandora Komara Îslamî de û wd, destê Amerîkayê girêdaye û naçar bi pejirandina biryarekê kiriye ku çend roj dibe bal û raya cîhanê bo aliyê xwe kişandiye, ku ev jî gotûbêj digel Îranê derheq pirsa Îraqê ye. Bêguman encamên danûstandin û gotûbêjên Amerîka û Îranê li ser rewşa Îraqê dê wekî gotûbêjên çend salî yên Komara Îslamî bi sê welatên Ewropayê li ser doza Etomî ya Îranê be û dê bê encam bimîne û Îran tenê demê dikre û ditelifîne.

www.arsivakurd.org

# Rewşa Jinên Kedkar Yên Kurd Di Kûrexaneyên Îranê De

Her mîna hemû Kurdên din, jinên kedkar jî ji ber nebûna şol û bi taybetî nebûna kareke jêhatî, bi hezaran ji bo bidestveanîna bijîva jiyanê, alîkarîkirin bi hevjîn û zarokên xwe tevî mêrên xwe rû li karên herî giran yanî kar di kûrexaneyan de dikin.



*Jiyana Jinên kedkar di kûrexaneyên Îranê de gelek dijwar e.*

Kar kirin di kûrexaneyan de serbarê vê yekê ku kareke şev û rojî ye û di holeke gerim û di nava toz û xoliyê de dimeşe, divêt şev û roj kûrê bidin xebitandin û kerpûçan çê bikin, ne tenê ji bo jin û zarokan, belkî ji bo mêran jî kareke pir giran e.

Jinên kedkar di kûrexaneyan de ji aliyekê divêt ji bo birîn û komkirina kerpûçan û her wiha anîna axa gerim û paqijkirina holê, alîkariya mêran bikin û wekî wan di kûrexaneyan de jî kar bikin û ji aliyê din jî divêt xarinê çê bikin, nan bipêjin, aman û cilan bişon û zarokan jî xwedî bikin. Li vir de eyane ku jin li kûrexaneyan du hemberî mêran kar dikin. Jinên kedkar li kûrexaneyan de tu demek ji bo bêhnvedanê nînin û dema ku hemû endamên malbatê ji bo vehevandin û nanxwarinê kom dibin, jin divêt mijûlê barhevkirina xwarinê, şoştina amanan, paqijkirina malê û amade kirina tiştan ji bo çûne ser karê kûrexaneyan bin. Rojên înê ku hemû karker tetîl in û mijûlê bêhnvedanê ne, dîsan jin mijûlê karkirin, şoştina cil û bergan û xwedî kirina zarokan û wd... dibin.

**Jinên Pêgiran Di Kûrexaneyan De**

Jinên pêgiran serbarê vê yekê ku di kûrexaneyan de kar dikin, lê li bêhnvedan û xwarinên jêhatî û li hemû midehê pêgiraniya xwe û piştî vê de jî ji zêrevaniya bijîşkî bêpar in û zor car ji ber zext û givaşên li ser wan û nebûna îmkanatên nojdariyê dayîk û zarok her du jiyana xwe ji dast didin.

Hemû evane û karê zehmet û giran yê kûrexanayê û nesaxiyên cur bi cur yên jinan dest dayne destê hev û jinên kedkar û zehmetkêş xistine bin zext û givaşeke zor ve û bûne sedema vê yekê ku reng û rûçik û endamên laşê wan jî wekî xwe nemîne û ji nav biçe û dest û tiliyên wan hemû tîş û şeq bin.

Eva rast e kakar kirin di kûrexaneyen de ji bo hemû kedkarekê zehmet û giran e, lê ji bo jinên ku di malê de jî karê maldarî û xwedî kirina zarokan jî dikin, du û sê hember zehmet û dijwartir e.

Pejirandina ev hemû zext û givaşên kar bo jinan pir zehmet e, lê jarî û belengazî ji aliyekê û jiyan kirin di civakeke mêr serdest û kevneşop wekî Îranê û bi taybetî di nava Kurdan de yê bûye sedema vê yekê ku jin hemû van zext û givaş û newekheviyan di meydanên kar de qebûl bikin û bipejirînin.

Divêt em bizanibin ku ji bo nehêlan û ji holê rakirina vê newekheviyê û mêr serdestiyê û ji bo bidestveanîna mafê wekhev di nava jin û mêran de eva jin in ku divêt zêdetir ji her kesekê di xebat û kar û barên jiyanê de têkoşîn û xebatê bikin.

**Çavkanî:**
Malpera Rassaa.com, Hacî Tawan

# Li Yasaya 36 Welatan De, Cudahîdanan Bi Dijî Jinan Heye

Deftera Rêxistina Efûya Navneteweyî di raporekê de ku li Rojnama Îl Payîs, çapa Îspaniya, roja sêşem, 7’ê Marsa 2006’an de weşandiye, da xuya kirin: “Aliyê kêm di qanûna 36 welatan de ferq û cudahîdanan bi dijî jinan heye”.

Ev rapore ku di bin navê **cudahîdanan çavkaniya tund û tûjiyê ye** de hatine belav kirin, piştî îşare kirin bi yasaya 36 welatan, cudahîdanan bi nîşaneya nebûna wekheviya jin û mêran da zanîn û got: Ev ferq û cudahîdanane, tund û tûjiya dijî jinan di van welatane de xurt dike.

Li gorî vê raporê newekheviya di mafan de, bûye sebeba vê ku jin ji îmkanatên berxwedanî tevî cudahîdananê ku di hemû warên jiyanê de pêve dinalin, bêpar bin.



***Di qanûna 36 welatan de ferq û cudahîdanan bi dijî jinan heye***

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî, hebûna cudahîdanana li yasayên van welatane de şermezar kir û bi bîr xist ku Rêxistina Neteweyên Yekgirtî 25 salan berî niha peymannameya ji nav birina cudahîdanan dijî jinan pejirandiye.

Hin ji wan welatên ku li qanûnên wan de ferq û cudahî heye û rapora navhatî îşare pê kiriye, pêkhatine ji, Îran, Erebîstana Seûdî, Nayciriya, Şîlî, Lubnan, Guatmala, Yemen û Sûdan. Li ser Îsraîlê jî hatiye gotin ku di vî welatî de jinên Cihû mafê telek û veqetiyanê tu ninin.

**Çavkanî:**
**Malpera “iran-emrooz”**

www.arsivakurd.org

# Bandora Komara Îslamî Li Ser Îtiyadê

**Werger ji Farsî: Meryem Hacîpûr**

Îtiyad bi madeyên bêhişker di Îranê de li jêr sîbera Komara Îslamî ber bi jêhel çûnê diçe. Îran yek ji rêyên derbaskirina madeyên bêhişker bi welatên din e û hikûmeta Komara Îslamî bandoreke zor li ser vê yekê heye. Îran welatek e ku goriyên zor di yekê nine, bi pestî bi tund û tûjî tevî mutadan riftarê dike û di rastî de dixwaze kesê mutad ji nav bibe ne ku derman bike.

Yek ji sedemên herî girîng yên hebûna berfireh ya madeyên bêhişker di Îranê de, rejîma Komara Îslamî û siyasetên wê yên şaş in.



*Mifahwergirtin ji mewadên bêhişker li Îranê bi awayekî berfireh zêde bûye. Li Kurdistanê jî hejmara goriyên narkotîkê her ku diçe pitir dibe. Narkotîk li Îran û Kurdistanê bi awayekî azad û bê asteng tê kirîn û firotin.*

xwe de cih daye û ev yeke jî terzê dîtina desthilatdarên rajîmê ji pirsgirêka îtiyadê re çavkanî digire.

Di rejîma Komara Îslamî de Serokên bandên firotin û belavkirinê nahêne destbiser kirin û ne sedemên tûşbûna goriyan bi îtiyadê dikeve ber lêkolîn û dahûrandinê, lê li hember de kesên mutad çend heyaman carekê ji rêgeh û parkan tên girtin û bi girtîgeh û kampan tên birin, lê piştî heyamekê dîsan xirabtir ji berê tên serbest kirin û ev dibe sedema vê yekê ku zêdetir ber bi aliyê îtiyad û mifah standin ji madeyên bêhişker biçin û di encam de canê xwe ji dest didin.

Terzê nêrînên desthilatdarên rejîmê eva ye ku dibe kesê/a mutad bihê destbiser kirin heta ku dest ji kêşandina madeyên narkotîkê berde, eva di halekê de ye ku di cîhana pêşkevtî ya îro de kesê mutad gunehbar nahê hesibandin, belkî gorî û nexweş tê dîtin ku dibe li jêr zêrevaniyên bijîşkî de be. Hikûmeta Îranê ku şiyana çareserî û dermana vê Rejîma Komara Îslamî li cihê kontirol û nehêlana madeyên sirker, hertim cehd kiriye ku bi darê zorê û tepeserkirina xelkê temenê xwe dirêj bike û ewan bi xwe sûç û guneh pênase kirine û bazneya vê ji diyarî kirine. Desthilatdarên rejîmê bi siyasetên xwe yên nerênî herîmeke tepeserker ji bo xelkê pêk anîne û roj bo roj civakê ber bi meraq û xirabiyê dibin. Serbarê vê yekê rejîma Komara Îslamî bi belav kirina madeyên bêhişker di nava girtîgehên xwe de û bi taybet li Kurdistanê cehdê dike ku qata ciwan ya civakê birizîne da ku hesta welatparêzî û xebatkariya wan ji nav bibe û di rastî de bi vê siyasetê cehdê dike ku temenê xwe zêdetir bike.

Ji aliyeke din ne tenê rejîm nikare tevî bandên mezin yên madeyên bêhişker(mafya) tevbigire, belkî desthilatdarên rejîmê li ber mifah û qazanca xwe alîkariya wan bandane didin.

**Jêder: karonline.com**

# Zeyneb Bayezîdî Di Rewşeke Nediyar De Ye




*Endama RMMK'ê, Zeyneb Bayezîdî li Mehabadê piştî girtinê bê ser û şûn bûye*

Piştî bihorîna du hefteyan, hêşta çarenivîsa Zeyneb Bayezîdî, endama Rêxistina Mafê Mirovan li Kurdistanê nehatiye eşkere kirin.

Heyamekê berî niha Rêxistina Mafê Mirovan li Kurdistanê da xuya kirin ku 5 endamên Îdareya Îtilaat (Ajan û Sîxor) a Mehabadê çûne ber derê mala Zeyneb Bayezîdî û piştî gerana mala vê, hate binçavkirin û bo ciheke nediyar hate birin. Îdareya Ewlekariya bajarê Mehabadê derheq armanca xwe ji girtin û binçavkirina Zeynebê tu agahiyek nexistiye rojevê û ew jina çalak ya Kurd di rewşeke nediyar de dijî.

**Çavkanî: Malpera rassaa.com**

# Xebat Ji Bo Eşkerekirina Çarenivîsa 18 Keçên Kurd Li Mîsrê




Navenda Helebçe a dijî enfal û jînûsaydkirina gelê Kurd naskirî bi "ÇAK", dest bi çalakî û xebateke berfireh ji bo eşkerekirina çarenivîsa 18 keçên Kurd ku di sala 1988'an de bo welatê Mîsrê hatine şandin, kiriye. Vê Rêxistinê dest bi rêze çalakiyekê li hember balyozxaneyên Mîsrê li Ewropa diket.

Di van çalakiyane de dê daxwazê bikin ku çarenivîsa 18 keçên Kurd bihê eşkere û ron kirin. Vê rêxistinê da zanîn ku hetanî niha çendîn caran bi awayekî fermî daxwaza eşkerekirina çarenivîsa van kesane hatiye kirin, lê welatê Mîsrê tu bersîvek nedaye.

Tê zanîn ku keçên navhatî piştî bombebaran kirina bajarê Helebçayê ji bo dermankirinê bo welatê Mîsrê hatine şandin.

**Çavkanî: rassaa.com**

www.arsivakurd.org

# Rewşenbîr Û Şaristaniyet

**Dara Natiq**

Rewşenbîrî hatiye peyda kirin... mirov zaf çax û serpêhatî bihorandine heya ku bi kar û berheman, bi şaşî kirin û rast kirina wan, bi ceribandin û şarezayî peyda kirin, bi pile û astê têgihîştina xwe geşandiye û pêşketiye û hêdî hêdî rewşenbîrî peyda kiriye. Rewşenbîrî ji nifşekê bo nifşekî din û bi derbasbûna salan roj bo rojê xurt bûye û heya ku xwe gehandiye asta îroyî.

Rewşenbîrî hunerekî giştî û taybetî ye, neteweyî û mirovanî ye... taybet e bi morkên neteweyî ên xwe... giştî ye bi têfikrîna mirovatî a xwe ve... zengîn e bi ku ji raw û nêçîr, pezdarî, çandin û kêlan, pîşe û pîşesazî, çêkirin û avadankirin, bazirganî û senet û ... pêk hatiye. Her civakek kêm û zêde cure şaristaniyetek taybet bi xwe heye, pêşkevtin û paremayîna wê şaristaniyetê jî vedigere ser astê têgihîştin û pêşveçûna wê civakê. Rewşenbîrî û şaristaniyet hizir û bawer, deb û edetên paremayî û nebaş ji nav dibe û civak ber bi pêşkevtinê diçe. Şaristanyeta serdemê niha dema mirov bi dirêjahiya rojê bi xwe ve girtiye, jiyana wê kar, berhem û xizmet kirin e, mandîbûn û bilezî ye, gire gir û temahbûn û westiyan cihê hêminî û veheviyanê girtiye, asta deb û edetan pêkhateyên xwe ve... li ser xwe ye, ji ber ku guhertin û veguhertin û perwedehiya derûnî a mirov ku ji riftar û kiryarên hişmendî yên wî pêk hatiye, aloz û giran û dirêjheyam in.



Rewşenbîriya netewan pêka ast û metod, tixm û kakila wê ne weke hev in. Her neteweyek rewşenbîriya taybet bi netewa xwe heye, ev cudahiya bingeha man û çeka serbixweyî a yekîtî û resenayetiya wê diparêze. Ziman pişkeke herî girîng ji rewşenbîriya neteweyî ye.

Rewşenbîrî ji pêkhateya hizrî–riftarî a civakê çêbûye. Tev beş û aliyên wê ji du tixmên sereke pêk tên ku hizr û riftar e. Rewşenbîrî tev kar û çelengiyên hizrî û riftarî yên civakê ye ku pêk hatine ji: hizir, ziman, zaniyarî, wêje, çand, zanist, deb û edet, buhayên civakî, bawer û ol, kultur û metodên jiyanê.

Rewşenbîrî aliyên netewî û mirovayetî bi xwe ve digre. Serbarê vê çendê ku her neteweyekê rewşenbîriya neteweyî a xwe heye, rewşenbîr ji hev nehatine veqetandin, kêm û zêde li ser hevdu xwedî bandor bûne. Ev astê ku rewşenbîrî pêgihîştiye berhem û tevlî bûna tev rewşenbîran e, encama wê, ceribandin û şarezayiya civaka mirovahiyê ye.

Pêwendiyeke germ û berdewam di navbera rewşenbîrî û şaristaniyetê de heye. Ne rewşenbîrî bê şaristaniyet dibe û ne jî şaristaniyet bê rewşenbîrî dibe. Rewşenbîrî bi hegera şaristaniyetê geşe kiriye û pêgihîştiye. Şaristaniyet jî di heyamê çêbûna wê de mifahê ji aliyên rewşenbîrî bi taybetî zaniyariyê werdigre.

Rewşenbîrî xizmeta şaristaniyetê dike û şaristaniyet jî rewşenbîriyê pêdigehîne, wate hev dikemilînin.

Şaristaniyet tevahiya destkevt, cî bi cî kirin û avakirina wan alav û amûrane ye nizim bûye, pêwendiyên malbatî û xizmatî û dostîniyê weke berê ne xurt in, bertîl xwarin û berjewendîxwazî zêde bûye, zêdetir girîngî bi aliyên alavî û rûyekî yên jiyanê tê dan, neku aliyên derûnî û morol û rewiştên bilind.

Hekî asta hişiyarî û rewşenbîriya neteweya paremayî nehête geşe kirin, li janesera paremayî û paşverûyiyê nahête rizgar kirin û roj bo rojê ji karwanê pêşkevtinê parve dimîne û paşgir û bindest dimînin.

Şaristaniyet rêbaz û rêça avakirina jiyana civakî a xelkê pêşkevtî ye, metoda rêxistina kar û barên civakê ye, neçar kirin û haydana zêdetir a ast û berhemên rewşenbîriyê ye, şaristaniyet ciwanî û guhertin e, bedewiya riftar û livîna mirov e, pêşkevtin û mirovahî ye, azadî û dmokrasî ye, edalet û parastina yasayê ye, çêkirin û avadanî ye, pêşkevtina jiyana alav û amûrî ye, avakirina berhemên xizmet kirin û garantiya civakî ye, bicî gehandina erk û parastina maf û rastbêjî û ... ji barçaviyên herî baş yên şaristaniyetê ne.


***Jêder:***

***1- Kovara " Senterî Birayetî", hejmar 28***

***2- Kovara Raman, hejmar 33***

***3- Pirtûka "Lêkolîneveyekî Wêjeyî"- Fuad Mistefa***


# ŞEHÎD

**Meryem Hacîpûr**

Ey sembola cesûrî û cangorîtiyê, bi kîjan bilûra bisoz ji te re bipeyivim û bi kîjan sorpênûseke evînê ji bo evîna te ya bilind bîr bikim û bi kîjan dîtinê peykerê te yê bixwîn hembêz bikim.

Asîman li hember panahiya riha te ya bêdawî şermê ji xwe dike û çiya li hemberî bilindahiya canê te yê paqij kirnûşê dibe, ka bêje bi çi îhsaseke paqij te ji bîr bînim û navê te bihûnm û bi kîjan evînê baxçê sîngê te yê bi gul derbas bikim. Ey mêrxasê xewn û xeyalên di xwînê de sor bûyî, mirov çawa dikare gernasiya bê dawiya te şirove bike te ku canê paqije xwe weke ala rengîn gorî kite dara evînê kir, ka bêje ez çawa rêz bigrim li paqijiya te ya bê tixûb, tu ku per û bask girtî ji evîna welêt, kunc bi kuncê esmanê mêrxasiyê bi hêza evîna xwe xemilandiye, çawa dikarim te mêvanê xewn û xeyalên xwe bikim, tu ey rûgehê aşiqên cangorî, ber bi kîjan rûgehê sekinî ku wiha bêtirs hebûna xwe di eşqa welêt de winda kiriye, tu ey mêvanê xewn û xeyalên min yên bi evîn, bi mezinahiya canê paqije xwe min jî tevî xwe bibe bo diyarê evîndaran û niqom bûn di behra evîn û cangorîtiyê fêrî min bike, ey sembola rojên paqij û ronahiyên azadiyê, demekê raweste û bi bêhna dilovaniya canê xwe bêhn xweş bike demên min yên tenêtiyê, bimîne û ronî bike şevên min yên êxsîrê xerîbiyê, ey ronîkerê şevên bi zilmat û tarî, bimîne û bibe dergehek ji bo evîndarên bê dergeh ey bê dawî, xwezî min weke kevokeke evîndar û xerîb hêlîna xwe li ser sîngê te yê evîndar çê kiriba û hêdî hêdî di xelwetgeha çavên te de strana ey şehîd vehûnaba, xwezî min karîba kunc bi kuncê mezinahiya te ya tevlîhevbûyî bi tîrêjên hêviyê seh bikim û ji te re bipeyivim.

Lê îro tevî tîrêjên mezinahiya te soz û peymanek ji hêviyê girê didim û li ser rêya te ya bixwîn, qevdikek ji gulên sernixwîn û evîndar diçînim û ji kûrahiya dil û canê xwe hawar dikim ku tucar û tucar bîr û rêya te ji bîr nakim ey nemirê gevizî di xwîna herî paqij de ey şehîd.

www.arsivakurd.org

# NEWROZ

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com


Rûpelên dîroka mirovahiyê bi gelek rojên pîroz û pîrozwer ên ku wekî zolak û zivrînekên watedar û payedar hatine/têne qebûlkirin, mişt tijî ye. Ev rojên pîrozwer ên ku mişt bi kêf û coş û hengaweyên girseyî têne pîrozkirin, gelek caran dibin hincet û navgîna yekîtî, pevreyî û şêwirdariya gel û civakan jî. Her wekî din digel hikm û bandora xwe ya pozîtîf(erênî), rê û rêçên rewnaq li ber guherîn û vegiherînên çandî, komelî û ramyarî vedike û tevê mirovahiyê ber bi atmosfereke xweş û xweşbîn ve dike.

Bo nimûne; Bûyîna Îsa (zayîn), Raperîna Spartakûs, Tevgera Ronesansê, Şoreşên Burjuwaziyê, Şoreşa Pêşesaziyê, Şoreşa Bolşewîkiyên Sovyetê(17'yê Kewçêrê), 8'ê Adarê, 1'ê Gulanê, hilweşîna text û serayên qeyser û serwerên dinê, têkçûna şahînşahiyên dîrokî, rûxandina keleyên zilmê û hwd... hemû rojên melûm û binîşan in ku wekî rojên pîrozwer têne qebûlkirin, dexmeya xwe li dîrokê dane.

Beriya Îsa (Beriya Zayînê) 612 ango beriya îro bi 2394 salan, şeva 20'ê Adarê ya reştarî, bi agirê Kawayê Hesinkar re li şewl û şemalek ronîdar dageriyabû. Ew agirê ku tîna xwe dabû çar nikarên dinê, îro wekî pêtaleke azadiyê her ku diçe gurtir û xurtir dibe û dil û mêjiyê dehaqên hemdem dibirîjne. Îro gelên Mezopotamiyayê (Mezrabotan) bi hemû dildarî dilaweriya xwe li vê mîrateya giranbiha xwedî derdikeve û ji bo hemû gelên bindest ên cîhanê pêşengiya azadî, aştî û aramiyê dike. Ev yek jî ji bo mirovahiya îroyîn û dêwera mirovahiya şens û siûdeke pêpayan e.

Dergûşa şaristaniya gelan û rikn û ripinê çand û çandinî, hilberîn û adaniya bi ber û behrem xaka Mezopotamiyayê her gav bûye qada şer û êrîşên giran û hinceta pevçûn û lêkdana hêzên dagîrker û zoran. Ligel ew qas êrîş, qirkirin û komkujiya bi hezaran sal, dîsa jî gel û civakên vê erdnîgariyê hêz û qudreta xwe ji çand û dîroka xwe ya berxwedêr û serhildêr wergirtiye û bêwestan û rawestan li hember van êrîşên giran derketiye. Newroz jî yek ji wan rojên payeberz û pîrozwer e ku wekî salvegera rûxandina Textê Dehaqê Nînowayê ku bi destê Kawayê Hesinkar pêk hatiye, tê pîrozkirin.

Newroz, ji du bêjeyên ku li peyveke hevedudanî dageriyaye pêk



tê. Peyva "nû" û " roj" wekî "Newroz" hatiye bilêvkirin. Belê Newroz, ji wateya xwe ya rastîn wêdetir, wateyeke dîrokî û efsaneyî jî di xwe de dihewîne. Ji bo ku Newroz û wateya wê ya efsaneyî were fêmkirin, divê ku ew ji hêla civakî, olî û dîrokî ve, bi awayekî dorhêl were nirxandin û ravekirin.

Li gorî jêder û çavkaniyên dîrokî, ev roja pîroz di dem û domana peyamberiya Zedeştê Kal û civaka kolemend de derketiye holê. Der barê vê yekê de ramanwerê Awusturyayî "Friedrich Wilhelm Nietsche"(Nîçe) bêtir serê xwe êşandiye û pê eleqedar bûye. "Nietsche" hem der barê Zerdeştê Kal û hem jî der barê dem û domana ku Zerdeşt tê de jiyaye lêkolîn û dahûrandineke berfireh kiriye. Li gorî "Nietsche", feraseta Zerdeştî qet naşibe baweriya olên xwedayî yên din. Û li gorî vê baweriyê, mirovahî di navbera Qeyser - qeran û Xweda de qet nehatiye esirandin. Heta Zerdeştê Kal gelek caran bi Xwedayê Qenciyê (Ahûramazda) re dikeve cirê; pê re şer dike û wî didarizîne. Her wiha li gorî felsefeya Zerdeşt, dardestiya Xweda û Qeyserên demê jî qet ne rewa bûye. Berevajî wê, mirov dikaribûn xwe ji Xwedê jî bikin; li hember zilma qeran û zordarên demê derkevin û bi vîna xwe tevdigerin... Ji bo wê ye ku şoreşa ramanî ya herî mezin di vê dem û dewranê de pêk hatiye. Ev jî li ser hizr û ramana Zerdeştî û bîr û baweriya wî ya serhildêr ava bûye. Û soxî ev feraseta pêşketî bi Newroza Pîroz bi encam bûye.

Newroz, raperîna bindestiyê û serkeftina hemû gelên qedîm ên Rojhilata Navîn e.. Newroz, têkçûna zilm û zordariyê ye. Newroz, hesret û azweriya mirovahiyê ye. Newroz, daxwaza xwebûn û hebûnê ye. Newroz, peroş û heyecana serfiraziyê ye. Newroz, banga aştî û azadiyê ye. Newroz, fikr û hizra yekîtiyê ye. Newroz, mirad û meqseda biratiyê ye. Newroz, hinceta ewlekariyê ye. Newroz navgîna şabûn û şahiyê ye... Û Newroz, misogeriya aşbûn û aramiyê bi xwe ye.

Kaniya Helbestan

## NEWROZ

**Latîf Epozdemir**

Newroz e sala teze hatiye
Dê ji malan werne der
Ji xewa mirî şiyar bin
Erd û esman dar û ber.

Newroz e ku agir xiste dil û can, dişewitîne bedenê.
Bi sorgulan di xemile, xala li ser gerdenê.

Newroz e ku îro lewra
Em diçin bo seyranê
Kesek nemîne di malan
Geş kin refên dîlanê.

Newroz e ku bi vê qedrê, silav bidin neyaran,
Biçînin tovên aştiyê, ku şîn bibe li beyaran.

Newroz e ku goye sersal e
dibêjin roja destpêka bihar
Dûr be ji pêsîrê reşî
Her tim sibê û êvar.

Rabe Letîf tu jî here gulşenê, dagre îro meya eşqê li bedenê,
Çêke tu jî, baxek ji gul, bide yarê bo xelat a kemberê.

## NEWROZ HAT

Ku newroz tê
şa dibin
zinar û lat
dicoşe bihar
dest bi gul in evîndar,
Ku newroz tê
jıyan dertê ji xewê
tîn dikeve hewayê
reng kesk dibin

Dar û ber
gul difeqin
sor û zer
her der xalîça rengîn.
Ne kûlîlk man bin axê
ne jî giyayek xemgîn.

Bi destê min gulên sor
ji eywanê diçim jor
pîroz dikim wê delal
dide min maçek zelal,
Dinya dibe gulistan
Lewra ye ku roj nû ye
ew roj xweşî aj bûye
Ehrîman şikestî ye,
Hurmiz bi ser ketî ye.

Dehaq bi birîna germ
ketî ye binê axa nerm
gelê arî bûn kubar
newroz wan dike şiyar.

www.arsivakurd.org




**Çeprast:**
1. Nivîskarekî Almanî ye – Sarkirina demjimêrê di Farsî de.
2. Navê rûbarekê ye di parzemîna Asiyayê de – Tirs.
3. Şerm û heya – Komîsyona Aborî a Afrîqayê.
4. Pezê mê – Hekî **N** bihê zêde kirin, navê kesekê ye ku li ser geşe kirina civakê lêkolîn kiriye.
5. Bo – Heke **K** bihê zêde kirin, navê rêxistinekê yê di Kurdistanê de.
6. Nêzîk – Heke di Îngilîzî de.
7. Navê bajarekî Kurdistanê ye – Kurtkiriya "I Em" di Îngilîzî de.
8. Mesb – Kok û binetar di farsî de – Îdareya zaniyariyên hertimî a NY.
9. Zîrek – Bajarekî Îranê ye.
10. Nexweşiyek e – Bajarekî Îranê ye.

**Serjêr:**
1. Ev tişt ji aliyê "Kîn"ê Amerîkayî ve hate çêkirin – Navê gulekê ye.
2. Heywanek e – Di kolika mirîşkan de heye.
3. Rojeke heftiyê – Rê – Xwê
4. Vexwarinek e – Berevajî di Farsî de tê wateya zarok.
5. Belê, belê – Teyrek e.
6. Rêz û hurmet di Farsî de – Di Erebî de navê mehekê ye.
7. Navê çiyayekê ye di Kurdistanê de – Heke di Farsî de.
8. **A** bihê zêde kirin, kurtkiriya navê welatekê ye – Sindoqa navneteweyî ya dirav – Navendekî nûçegihaniyê ye.
9. Kanê – Navê keçan e.
10. Navê partiyekê ye di Tirkiyê de – Mîr

## Besiva Xaçepirsa hejmara 35'an




# Li Sine Komeleya Sînema Kurdî hate damezirandin

Sînemaya Kurdî ku di van salên dawî de di zaf festîvalan de gelek xelatan distîne gavek din a mezin jî avêt. Li Rojhilata Kurdistanê bi mebesta afirandin, belavkirin û bazarkirina 'Sînemaya Kurd' komeleyek hate damezirandin.




*Di van salên dawî de di zaf festîvalan de gelek xelatan distîne*

Ev komaleya bi navê **'KurdFîlm Assosiation'** ku li Bajarê Sine yê Rojhilata Kurdistanê hatiye damezirandin, bang ji hemû Kurdên ku li ser Sînema, fîlm û dokûmenteran kar dikin dike ku bi wan re bikevin têkiliyê û bi hev re tevbigirin.

Serokê Komaleyê Emîr Nûrî da zanîn ku armanca wan ew e; Kurtefîlm, dirêjfîlm, bernameyên televîzyon û dokûmenteran çêbikin û bi hemû kes û saziyên Kurd yên her çar perçeyan û yên dîasporayê re di derbarê fîlm-vîdeo produksîyon, belavkirin, frotin û pêşandana wan de hevkariyê bikin.

Emîr Nûrî di berdewamiya vegotina xwe de destnîşan dike ku di serî de li Kurdistan û her wiha li Îranê, Tirkiye, Îraq û Efxanistanê de çêkirina fîlman di warê aborî de herêmên bikêrhatî ne û pêwîste ev herêmên bi kêrhatî bên bi kar anîn. Emîr Nûrî vegotina xwe wiha didomîne:

"Di van salên dawî de bal kîşandina Sînemaya Kurdî me arasteyî vî karî kir. 'KurdFîlm Asossiation' bi merama afirandina berhemên Sînemayî û bi hevkariya Îran, Îraq û Efganistanê hatiye damezirandin. Her wiha pêwendiya me bi hin sînemavanên Tirkiyê, Ozbekîstan û Tirkmenîstanê re jî heye. Ji ber ku li Ewropa û li Amerîka çêkirina fîlman pir biha ye, me hewl da xwe ku em li Rojhilata Navên karê xwe yê sînemayî bi pêşve bibin."

Serokê Komaleya KurdFîlm Asossiation, Emîr Nûrî di dawiya vegotina xwe de dide zanîn ku ew dixwazin fîlmên nû mijar û yên ku bi taybetî, avahiya çandî ya Rojhilata Navîn diyar dikin, çêbikin. Nûrî dibêje: "Em dixwazin fîlmên ku dê bên afirandin pêşkêşî kompanyayên belavkirin û frotinê bikin. Bi vê meremê em alîkarî û hevkariya balkêşgerên sînema û kompanyayên ku kar û barê sînemayî dikin, dixwazin. Kesên ku dixwazin bi me re bikevên têkiliyê bi rêya bîroyên me yên li Îranê dikarin xwe bigihînin me."

**Jêder: PUKmedia.com**

www.arsivakurdi.org

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/kurmanci. php

**Navnîşana derveyî welat:** AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE
**E - Mail:**
**rojnama_agiri@yahoo.com**
**agiri2003@hotmail.com**



## Li Amedê Di Encama Lêgerîna Xezînê De Girikek Hezar Salî Derket Holê



*Girikê hezar salî yê dîrokî ku li Amedê hate peyda kirin*

Hate diyar kirin kesên ku li derdora Farqînê li xezînê digeriyan, li ser riya gundê **Boşat** a ser bi **devera Farqîna Amedê** li herêma **Rêya Sor**, rastî girikek hatine. Girik, di encama xebatên kolandinê ku bi wesayîtên kar hatine kirin derkete holê. Şaredarê Farqînê Fîkret Kaya ragihand ku gundî bi kolandinê hesiyane û şaredarî agahdar kirine. Kaya, da zanîn ku dest bi lêkolînên têkildarî girikê kirine û got ku girik, 2 meh beriya niha ji aliyê xiznevanan ve hatiye vekirin. Kaya da xuyakirin ku li derdora girikê rastî gelek parçeyên cêran hatine. Kaya, anî ziman ku ji ber ku Farqîn cihek dîrokî ye, beriya niha jî gelek kesî ji wan re gotiye ku xiznevan li van deran digerin û zirar didin deverên dîrokî.

**'Farqîn dergûşa şaristaniyan e'**

Kaya got: Girikê ku hatiye dîtin, dişibe odeyekê, 6 deriyê wê hene û texmîn dikin ku di dema Helenîzmê de wekî dêr û îbadetxane hatiye bikaranîn. Kaya destnîşan kir ku ronîkirina vê yekê, di hêla aşkerebûna dîroka Farqîn û Anatoliyayê de gelek girîng e. Kaya diyar kir ku wek Şaredariya Farqînê, bang ji hemû zanîngeh, arkeolog û dîroknasan dikin û wiha dom kir: "Em vî mîrateya dîrokî derxin ser rûyê erdê û bihîstyarî nîşan bidin." **'DÎHA'**

## 2 Milyon Tûmen Ceza Bo Her Yek Ji Girtiyên Serhildana Makûyê



Wênê: makucity.com

**Agirî:** Li gorî biryara bi nav dadgeha rejîmê, bo her yek ji wan kesên ku di xwenîşandanên bajarê Makû û derdora wê de hatine girtin, 2 milyon Tûmen(2200$) siza hate diyarî kirin.

Hêjayî gotinê ye ku ev biryara neadilane di axekê de ye ku nêzîk bi 800 kes ji xelkê bêguneh û sivîl div ê midehê de ji aliyê hêzên rejîmê ve hatine girtin û û piranî jî kesên jar û belengaz û destkurt in û di bin sîbera desthilatdariya Komara Îslamî de karîn û şiyana dabîn kirina bijîva jiyana xwe ninin, heta bigihîje dabîn kirina sizayek wiha giran.

Rejîma dijî mirovî a Komara Îslamî ne tenê tu girîngî û hawriyek ji daxwazên rewa yên xelkê belengaz û bêpar yê makû û derdora wê re nedane, ji berku bi kuştina 10kes û birîndar kirina bi dehan kesan da selimandin ku di rêbaz û siyasetên rejîmê de tu mafek bo mirov nine û sizaya dengên nerazî û mafxwaz jî mirin e.

Hêjayî gotinê ye ku di sîstema dadmendî!!! Ya hikûmeta Welayeta Feqîh de tu dadgehek bo pêregihîştin bi doza kes û karên kuştiyan nine.

## Şahiya Newroza 2006'an, Li Bajar Û Herêmên Kurdistana Îranê De Bi Coşek Mezin Hat Pîroz Kirin

**Agirî:** Îsal jî serbarê hemû cehd û xebatên bêencam yên sazî û dezgehên tepeserkar yên Komara Îslamî jib o kêmreng kirina rê û resmên Newroz û sersalê, di hemû bajar û deverên Kurdistanê de bi coşek germ birêve çûn.

Tevî wê ku dema nûbûna sala taze û sersalê di şevê de bû, lê ciwan û xelkê bajar û deverên cur be cur yên Kurdistanê her ji êvariya roja dûşemî, 29.12.1384(20.03.2006)'an, bi derketin ji malên xwe ketine hilkirina agir û dawet û şahî, belav kirina şekrokan û bilindkirina alaya Kurdistanê û pîrozbahî kirin ji hev ber bi pêşwaziya Newroz û sala taze çûn.



Li gor nûçeyên ku gihîştine destê me, cehd û tekoşînên hîzên rejîmê jib o bela kirina ciwanan û xelkê bajarên Mehabad, Bokan, Merîwanê, bûye sebeba pevçûnan di navbera hêzên tepeserkar û xelkê de. Di encamp de çend kes ji ciwanan birîndar bûne û hejmarek jî hatine binçavkirin.




www.arsivakurd.org